

GOTARÊN VEKOLÎNÊN ÇANDA KURDÎ



Edîtor
Zülküf ERGÜN

Nûbihar

Gotarên Vekolînên Çanda Kurdî

Edîtor: Zülküf ERGÜN

Edîtorên Qada Dîrokê: M. Rezan EKİNCİ - Ercan GÜMÜŞ

Weşan No: 466 | Lêkolîn

ISBN: 978-625-6605-54-1

Çapa Yekem: 2024

Gerînendeyê Giştî yê Weşanê: Süleyman Çevik

Berg: İHB Reklam Ajansı

Mîzanpaj: Dawud Rêbiwar

Çapxane

Meteksan Matbaacılık ve Teknik San. Tic. Aş.

Beytepe Köy Yolu No: 3/06800

Bilkent-Çankaya / Ankara

Matbaa Sertifika No: 46519

Nûbihar

Pak Ajans Yay. Tur. ve Dış Tic. Ltd. Şti.

Zeyrek Mah. Serdab Sk. No: 26/3 Fatih/İstanbul

Tel: 0212 519 00 09

www.nubihar.com | email: info@nubihar.com

Yayın Sertifika No: 51437

NAVEROK



Destpêk	07
Kawa û Alaya Wî di Şahnameyên Kurdî de	
Shahab Vali	09
Edebîyata Devkî ya ku li dor Rûdanên Tedîb û	
Tenkîlê Çêbûye: Mînaka Rojavayê Xerzan	
Ayhan Yıldız.....	35
Jin di Kilamên Dengbêj Şakiro de	
Gülbeddin Gülmez.....	73
Analîza Lorîkên Kurdî ji alîyê Tema, Taybetmendî û Naverokê ve	
Türkan Tosun.....	101
Mamikên Kurdî ji alîyê Teşeyê ve	
Mehmet Yüce.....	129
Veguhestina Nirxên Çandî di Pirtûkên Zarokan de	
Ferhat Çiftçi.....	159
Medhiyeyeke Mela Ebdulhemîdê Saxnisî (1870 –1955)	
M. Zana Karak	177
Peyrevê Melayê Cizîrî: Şêxê Meczûb û Dîwana Wî ya Kurdî	
Mesut Arslan	205
Unsûrên Tesewîfî di Dîwana Ehmedê Xanî da	
Önder Beyter.....	221
Vegêrana Neteweyî li ser Bingeha Mîtos û Dîrokê:	
Mînaka Donzdeh Siwariyên Merîwanê	
Güneş Kan.....	243
Risteyên Kompleks di Tesrîfa Teremaxî da	
Ahmet Seyari.....	261
Psikoloji Tezlerinde Kürtler ve Kürt Meselesi Üzerine	
Tematik Bir İnceleme	
Ümit Eser, Aydın Bayad, Kenan Alparslan, Ercan Şen	273

Kürt Milliyetçiliğinin Tarihini Milliyetçilik Kuramları Bağlamında Değerlendirmek (1690-1918)	
Orhan Örs.....	301
Osmanlı Döneminde Kürtlerin Kullandığı ve Ürettiği Silahlar	
Kenan Bozkurt.....	335
19. Yüzyılın İkinci Yarısında Osmanlı Yönetiminin Vilayat-ı Şarkıyye’de Aşiretlere Yönelik Değişen Politikası Bağlamında Çeçen İskanı	
Caner Yelbaşı.....	377
تحلیلی بر جغرافیای کردستان خراسان (کردستان شمال شرقی- کردستان -کردخانه) و ولایات کرد نشین از عصر صفویه تا پایان قاجار	
علی رحمتی	389
بررسی عوامل فرهنگی در طرح و نقش قالی‌های کردی دو ایل مستقل شادلو و قراچورلو در ولایت بجنورد	
اکرم بخشی.....	411
The Role of a University in the Context of Institutional Academic Consultancy for Regional Development; The Case of Mardin Chambers/Bourses	
Mehmet Behzat Ekinci, Metin Sert, Ömer Doru.....	435
Kamran Ali Bedirhan’ın “Hedîsên Cenâbê Pêxember” Adlı Tefrikası Üzerine Bir Değerlendirme	
Bayram Kanarya.....	457
Risale-i Nur’un Kürtçe Tercümelerinde Çeviri ve Dil Sorunları	
Nevzat Eminoğlu	471
Rexneyek li ser Wergêrana Cihnavên Kesê Sêyem di Mealên Kurdî da	
Haşim Özdaş,.....	485

REXNEYEK LI SER WERGÊRANA CIHNAVÊN KESÊ SÊYEM DI MEALÊN KURDÎ DA

Haşim ÖZDAŞ*



Destpêk

Cihnav di zimanê erebî da bi çend awayan hatine binavkirin. Li ser meseleyê zimannasên ji Besrayê bi maneya “tiştê ku dikeve şûna navdêr”, peyva “îdmar”, “mudmer” û “demîr”ê, lê zimannasên Kûfeyî bi maneya “tiştê ne aşîkar” peyva “kî-naye” û “meknîy”ê bi kar anîne (Ezherî, 2000, 1, r. 97). Cihnav ji alîyê zimannasên zimanê erebî ve bi maneyên nêzî hev bi çend şiklên cuda hatine pênasekirin. Hinek ew weha terîf kirîye: “Tiştê ku dikeve şûna navdêrê aşîkar/dîyar û wî vedişê-re” (Suheyli, 1992, r. 170). Cihnavên ku cihê navdêran digirin û wan vedişêrin mîna “dîyar” hatine qebûlkin. Lewra kesê li hember dizane ku bi cihnavan qesda kê yan jî çi hatîye kirin (Sîbeveyhi, 1988, 2, r. 6). Lêbelê ji ber ku navdêran vedişêrin û bi vê yekê bi bal maneyên nepenî ve îşaret dikin di navçoveya mibheman da hatine nixandin (Aydın, 2012, r. 14).

Cihnav di erebî da nêr an jî mê ne; yekhejmar, duhejmar an jî pirhejmar in. Di çavkanîyên zimanî da cihnavên erebî wekî kesê yekem/mitkelim, kesê duyem/mixateb û kesê sêyem/xaib bi bal sê beşan ve tên dabeşkirin. Herweha cihnav bi awayê bariz/yên ku şikil û sûretê wan heye û mistetir/yên veşartî jî tên tesnîfkirin. Yên mistetir jî bi awayê cihnavên ku dikarin veşartî bin an jî divê mistetir bin; yên bariz jî wekî cihnavên ku mitesil in anku bi bêjeyê ve ne û yên minfesil anku ne bi bêjeyê ve ne, bi bal du qisman ve tên dabeşkirin. Ji xeynî vê, cihnavên mitesil ji alîyê îrabê ve wekî merfû, mensûb, mecrûr; yên minfesil jî bi şiklê yên merfû û mensûb tên teqşîmkirin (Îbn Hişam, 1963, r. 94-95; Ezherî, 2000, 1, r. 97-100).

Cihnavên kesê yekem û kesê duyem ji alîyê maneyê ve nabin sedema tevlihevîyê. Lêbelê mirov nikare heman tiştî ji bo cihnavên kesê sêyem bibêje. Lewra maneya wê bi navdêrê ku berî wê derbas dibe û wê îzah dike, zelal dibe. Ev yek weha tê îzahkirin: Mitekelim û mixateb di dema axaftinê da hazir in. Ev yek dibe şirove ji bo cihnavên kesê yekem û duyem. Lêbelê di cihnavên kesê sêyem da ev

* Doç. Dr., Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi İlahiyat Fakültesi, hasimozdas@gmail.com
Orcid: 0000-0002-4621-435X.

babet tune ye. Ji ber vê yekê hewcedarîya vê cihnavê çê dibe bi tiştêkî ku wê şirove bike. Loma navdêrê ku cihnav bi bal ve vedigere bi piranî divê berî wê derbas bûbe (Ebû Heyyan, 1998, 2, r. 252).

Dikare bê gotin ku ji hêmanên zimanî herî zêde cihnav di Qur'anê da cih digirin. Lewra di her rûpel heta her rêza wê da cihnameke aşîkar an jî neaşîkar derdikeve pêşîya mirov. Ji ber giringîya wê ye ku alîmekî mîna Suyûtî (w. 911/1505), zanîna bi cihnavan di serê wan qayîdeyan da hejmartîye ku divê kesê mufesir bi wan bizane (Suyûtî, 2006, 2, r. 580). Ji ber vê yekê tesbîta kes an jî tiştê ku cihnav wî/wê destnîşan dike ji bo cihnavên kesê sêyem xaleke giring e. Ji bo ku mirov maneyê baş fam neke û bi awayekî rêkûpêk têbigihîje divê bê tesbîtkirin bê ka cihnav bi bal çî ve vedigere. Heke na, dê di maneya ayetê da tevlihevîyek çê bibe. Lewma hema bibêje hemû mufesir li ser vê meseleyê bi hûrgilî sekinîne.

Di vê xebatê da em dê li ser meala hin ayetên ku cihnavên kesê sêyem di wan da cih digirin rawestin û paşê jî wergêraneke alternatîf pêşnîyaz bikin. Mînakên ku em dê wekî nimûne nîşan bidin jî dê ji van her du mealan bîr girtin: Ya ewil meala bi navê “Qur'ana Pîroz û Wateya wê Ser Zimanê Kurdî” ya ku ji aliyê Mela Huseyn Êsî, Mela Se'îd Girdarî û Mela Muhemmed Bêrkevanî ve hatîye amadekirin. Ya diduyan jî meala bi navê “Sîwana Qur'anê Meala Qur'ana Pîroz” a ku ji aliyê Abdullah Baykal ve hatîye amadekirin.

1. Çend Xalên Bingehîn di Heqê Cihnavan da

Gelek fonksîyonên cihnavan hene. Yek jê tekîd e. Ev uslûb tê bikaranîn da ku îfade bi hêztir û bandora wan zêdetir be. Yek ji fonksîyonên cihnavan jî ew e ku bi saya wan di navbera îfadeyan da peywendî çê dibe û bi hev ve tên girêdan. Ev peywendî ne bi tenê di navbera îfadeyên di risteyekê da tê avakirin. Lewra terkîbên ji hev cuda heta metnên ji aliyê zeman û mekan ve gelekî dûrî hev in jî bi saya wan bi hev ve tên girêdan. Bi xêra vê yekê dubarekirin ji holê radibe, rê li ber wê yekê tê girtin ku di maneyê da tevlihevî çê bibe û herî dawî di risteyê da hevgirtinek peyda dibe (Aydın, 2012, r. 31-35).

Bi kurtasî ji ber gelek sedem û amancan di şûna navdêran da cihnav tên bikaranîn. Mirov dikare wan weha îfade bike:

1. Hatina cihnavan ji bo rakirina îltibasê ji ser maneyê. Gava cihnav di şûna navdêran da tê bikaranîn, dike ku zelalîyek peyda bibe û mane bi hêsanî bê famkirin. Li ser meseleyê heke di ayeta Şu'era 26/45an da (فَالْقَىٰ مُوسَىٰ عَصَاهُ...) di şûna cihnavê “hu”yê da navdêr bihata bikaranîn (فَالْقَىٰ مُوسَىٰ عَصَا مُوسَى), dê tevlihevîyek derketa holê. Lewra dê guman bi wê yekê bihata kirin bê ka gelo Mûsayê diduyan heman Mûsayê ewil e yan yekî din e. Mirov dikare heman tiştî ji bo ayeta Hûd 11/42yan jî bibêje: (...وَنَادَىٰ نُوحٌ ابْنَهُ...) (Redî el-Esterabadî, 1996, 2, r. 111-112; Aydın, 2012, r. 33).

2. Hatina cihnavan ji bo îcaz û îxtisarê. Lewra gava cihnav mitesil be, digel

rakirina îltibasê di risteyê da kurtîyek jî hasil dibe (Redî el-Esterabadî, 1996, 2, r. 112). Ev jî dike ku peyv dubare nebin û bi peyvên hindik gelek mane bên îfadekirin. Herweha carinan bi hatina cihnavê mirov ji bikaranîna gelek navdêran xelas dibe (Zerkeşî, 1984, 4, r. 24; Suyûtî, 2006, 2, r. 580).

3. Hatina cihnavan ji bo mebestên belaxî. Gelek caran jî cihnav bi amancên belaxî tên bikaranîn. Îstimala wan ji bo mebestên bi vî rengî mirov dikare bi kurtasî weha îfade bike:

a. Tiştê ku behsa wî tê kirin ji ber ku gelekî navdar e, ji dêvla ku navê wî bi eşkereyî bê gotin, wesfek ji wesfên wî tê gotin. Mirov dikare ayeta Beqere 2/92yan a ku behsa Cebrail dike (...فَإِنَّهُ نَزَّلَهُ عَلَى قَلْبِكَ...) û ayeta Qedr 97/1ê ya ku dibêje Qur'ana pîroz di şeva qedrê da ji alîyê Xwedê Teala ve hatîye hinartin (إِنَّا أَنْزَلْنَاهُ فِي لَيْلَةِ الْقَدْرِ) mînak nîşan bide (Zerkeşî, 1984, 4, r. 24).

b. Tehqîr û biçûkxistin. Di çavkanîyan da ev ayetên ku behsa şeytan dikin Beqere 2/168an (...إِنَّهُ لَكُمْ عَدُوٌّ مُبِينٌ...), E'raf 7/27an (...إِنَّهُ يَرَاكُمْ هُوَ وَقَبِيلُهُ...) û ayeta Înşiqaq 84/14an (إِنَّهُ ظَنَّ أَنْ لَنْ يَخُورَ) a ku behsa wan kesan dike ku dê li axretê bedbext bin, wekî mînak tên nîşandan (Zerkeşî, 1984, 4, r. 25).

4. Di cihnavên kesê sêyem da tiştê bingeîn ew e ku berî wan navdêrek derbas bibe da ku bi bal wan ve vegerin û wan destnîşan bikin (Redî el-Esterabadî, 1996, 2, r. 111). Gava çend navdêr hebin jî ya esasî ew e ku cihnav bi bal navdêrê herî nêzî xwe ve vegere. Herweha dema peyvek bi bal peyvekê ve bê îzafekirin û piştî wan cihnavêk bê, tiştê bingeîn ew e ku bi bal midafê ve vegere, lê hin caran jî bi bal midafun îleyhê ve vedigere (Zerkeşî, 1984, 4, r. 25, 39, 41; Suyûtî, 2006, 2, r. 580-582). Ji xeynî vê, divê di navbera cihnav û navdêran da hevgirtinek hebe, anku di meseleya nêr-mê û hejmaran da mitabeqet hebe (Zerkeşî, 1984, 4, r. 25).

Li alîyê din mîna ayeta Taha 20/67an (فَأَوْجَسَ فِي نَفْسِهِ خِيفَةً مُوسَى) dibe ku cihnav bi bal navdêrekî ve îşaret bike ku herçiqaş li paş be jî, lê ji alîyê maneyê ve li pêş tê hesibandin. Tê gotin ku di ayetên Qeses 28/78; Rehman 55/39an da jî heman rewş heye (Zerkeşî, 1984, 4, r. 25-26; Suyûtî, 2006, 2, r. 580). Herweha dibe ku cihnav bi bal mane û naveroka risteyê ve vegere. Ayetên Beqere 2/187; Nîsa 4/8; Maîde 5/8; En'am 6/121; Sad 38/32; Waqî'e 56/83; Qîyamet 75/26; Qedir 97/1; 'Adîyat 100/4-5an ji bo vê yekê wekî nimûne tên nîşandan. Hin caran mîna ayetên Nîsa 4/11; Yûsuf 12/26; Mu'minûn 23/67; Qeses 28/26; Fatir 35/45; Rehman 55/26an ji peywendîyê tê famkirin bê ka cihnav bi bal çî ve vedigere û çî destnîşan dike. Herî dawî li gor rêgeza bingeîn divê ku cihnav navdêrê herî nêzî xwe destnîşan bike. Lêbelê hin caran berî cihnavê du navdêr derbas dibin û ji maneyê tê famkirin ku cihnav bi bal a dûrî xwe ve vedigere (Zerkeşî, 1984, 4, r. 26-27, 33).

5. Gava di risteyekê da çend cihnav hebin, heta mimkin be divê ku hemû bi bal heman tiştî ve vegerin. Ji ber vê yekê tê gotin ku çar cihnavên ku di ayeta Taha 22/39an da cih digirin, Hz. Mûsa îşaret dikin. Lêbelê hin caran mîna ayeta Kehf

18/22yan (...وَلَا تَسْتَفْتِ فِيهِمْ مِنْهُمْ أَحَدًا), ne bi bal heman kesan ve vedigerin (Zerkeşî, 1984, 4, r. 35-36; Suyûtî, 2006, 2, r. 582-583).

2. Çend Nimûne Ji Wergêrana Cihnavên Kesê Sêyem

Gava em bala xwe didin hin ayetên ku cihnavên kesê sêyem di wan da cih digirin, em dibînin ku car caran pirsgirêk di wergêrana wan a kurdî da heye. Li vir em dê bi rêya çend mînakên li ser vê pirsgirêkê rawestin.

Mînaka Ewîl: Beqere 2/144

قَدْ نَرَى تَقَلُّبَ وَجْهِكَ فِي السَّمَاءِ فَلَنُوَلِّيَنَّكَ قِبْلَةً تَرْضَاهَا فَوَلِّ وَجْهَكَ شَطْرَ الْمَسْجِدِ الْحَرَامِ وَحَيْثُ مَا كُنْتُمْ فَوَلُّوا وُجُوهَكُمْ شَطْرَهُ وَإِنَّ الَّذِينَ أُوتُوا الْكِتَابَ لَيَعْلَمُونَ أَنَّهُ الْحَقُّ مِنْ رَبِّهِمْ وَمَا اللَّهُ بِغَافِلٍ عَمَّا يَعْمَلُونَ

Li gor ku di çavkanîyan da derbas dibe Pêxember aleyhiselam û bawermendan di serdema Mekkeyê da berê xwe didan Beytulmeqdisê û wisa nimêj dikirin. Anku qible ne Mescida Heram, aliyê Qudsê bû (Teberî, 2001, 2, r. 657). Vê rewşê piştî hîcretê heta berî şerê Bedrê bi du mehan dewam kirîye (Bexewî, 1989, 1, r. 162).

Mîna ku hemû mufesir dibêjin mijara vê ayetê tehwlîla qibleyê ye, anku di ayetê behsa guhertina qibleyê ya ji Beytulmeqdisê bi aliyê Mescida Heram ve tê kirin (Muqatil, 2002, 1, r. 147). Lêbelê di heqê cihnava “hu”yê ya di îfadeya “ennehu”yê da bê ka çi yan jî kê destnîşan dike du nêrîn hene (Razî, 1981, 4, r. 136). Yek jê guhertina qibleyê ye (Bexewî, 1989, 1, r. 163; Zemexşerî, 1998, 1, r. 344), ya din jî Pêxember aleyhiselam e (Maturîdî, 2005, 1, r. 265).

Ev ayet di her du mealan da mîna li jêr hatîye wergerandin:

Maneya Qur’ana Pîroz: “(Ya Muhemmed!) Birastî em dibînin ku berê te ber bi esmanan ve digere (bi hêviya ku Ke’be bibe qible). Êdî teqez em dê berê te vegerînin ser qibleyeke ku tu pê qayîl î. Naxwe berê xwe bizivirîne aliyê mizgefta pîroz (Ke’bê). Hûn li ku dibin bibin êdî berê xwe ber bi Ke’bê ve bizivirînin. Bêguman ên xwedan kitêb baş dizanin ku ev (berzivirandin) ji cem Xwedayê wan e û heq e. Xwedê ji ya ew dikin teqez ne bêagah e.”

Sîwana Qur’anê: “Helbet em, zivirandina rûyê te yê ber bi asîmanan ve dibînin; emê jî, berê te bidin qibleke pê kêfa te bê. Êdî tu berê xwe bide hêla Mescida Heramê; hûn li ku dibin bibin berê xwe bidin hêla wê. Bêguman ewên xwedî kitêb, baş dizanin ku ew rast e û ji Rebbê wan e. E Allah ji tiştên ew dikin, ne xafil e.”

Cihnav di xebata ewil da bi awayê “ev”ê hatîye wergerandin û di nav kevanekê da (berzivirandin) hatîye gotin da ku bê zanîn ku mebest jê guherandina qibleyê ye. Cihnav di xebata diduyan da bi şiklê “ew”ê hatîye wergerandin. Ev gotin, dikare bi du awayan bê famkirin. Maneya ewil, Hz. Muhemmed. Maneya diduyan guhertina qibleyê. Lêbelê çawa ku Razî (w. 606/1210) jî dibêje ihtimala ewil bêtir nêzî rastîyê ye. Lewra mijara ayetê guherîna qibleyê ye. Ji ber vê yekê çêtir e mirov

bibêje ku cihnav guhertina qibleyê nîşan dide (Razî, 1981, 4, r. 136). Mirov dikare vê ayetê weha jî wergêre: “(Ya Muhemmed!) Em dibînin ku rûyê te gelek caran ber bi asîman ve vedigere. Teqez em dê berê te bidin qibleya ku tu dê razî bibî. Ka niha berê xwe bide alîyê Mescida Heram! (Gelî bawermendan! Hûn jî) li ku derê bin, (di nimêjê da) berê xwe bidin alîyê wê! Ew kesên ku ji wan ra kitêb hatîye dayîn, baş dizanin ku *ev* hikumê heq ji Rebbê wan e. Xwedê ji tu kirinên wan bê hay namîne.”

Minaka Diduyan: Beqere 2/146

(الَّذِينَ آمَنُوا هُمْ أَتَيْنَاهُمُ الْكِتَابَ يَعْرِفُونَهُ كَمَا يَعْرِفُونَ أَبْنَاءَهُمْ وَإِنَّ فَرِيقًا مِنْهُمْ لَيَكْتُمُونَ الْحَقَّ وَهُمْ يَعْلَمُونَ)

Li ser meseleya bê ka gelo “hu”ya di lêkera “ye’rifûnehu”yê da çi yan jî kê dest-nîşan dike du nêrîn hene (Zeccac, 1988, 1, r. 225; Îbn ‘Etîyye, 2007, 1, r. 378). Gelek mufesirên serdema ewil gotine ku cihnav, guhertina qibleyê destnîşan dike. Li gor vê, zanayên cihû û xiristîyan çawa ku zarokên xwe nas dikin, herwisa dizanin ku guhertina qibleyê rastîyeke ji Rebbê wan e (Muqatil, 2002, 1, r. 148; Ferra, 1983, 1, r. 85; Teberî, 2001, 2, r. 670-671; Îbn Ebî Hatim, 1997, 1, r. 255-256; Zeccac, 1988, 1, r. 225). Lewra di kitêbên wan da derbas dibe ku dê şerî’eta wan bi îslamê bê guhertin û Kabe bibe qible (Îbn ‘Aşûr, 1984, 2, r. 34). Lêbelê herçiqaş navê wî li vir derbas nebûbe jî hin mufesirên din gotine ku cihnav li vir Hz. Muhemmed nîşan dide. Li gor vê, zanayên cihû û xiristîyanan -ji ber ku di Tewrat û Încîlê da cih digire- dizanin ku Hz. Muhmmmed aleyhiselam pêxemberê Xwedê ye û di qasidîya wî da tu gumana wan tune ye (Îbn Ebî Hatim, 1997, 1, r. 255-256; Bexewî, 1989, 1, r. 163; Zemexşerî, 1998, 1, r. 345; Razî, 1981, 4, r. 141-142).

Ayet di her du xebatan da mîna li jêr hatîye wergerandin:

Maneya Qur’ana Pîroz: “Ewên ku me kitêb daye wan, çawa ku zarokên xwe nas dikin her wisa wê (heqîyê) jî nas dikin. Bêguman komek ji wan digel ku dizanin jî heqîyê vedişêrin.”

Sîwana Qur’anê: “Ewên me kitêb daye wan, çawa zaroyên xwe nas dikin, Muhemmed jî wisa nas dikin. Tevî vî awayî jî bêguman komek ji wan, bi qestî heqîyê vedişêrin.”

Cihnava “hu”yê di xebata ewil da bi awayê “wê (heqîyê)”, lêbelê di çapa 2015an a Dîyanetê da bi şiklê “wê (guherandina qibleyê)” hatîye wergerandin. Lewma mirov dikare bibêje ku di vê mealê da nêrîna piranîya mufesiran esas hatîye girtin û ayet li gor wê hatîye manekirin. Di xebata diduyan da -digel ku mijara ayetê guhertina qibleyê ye- nêrîna din hatîye tercîhkirin û cihnav bi awayê “Muhemmed” aleyhiselam hatîye wergerandin.

Ya rast, ji ayeta Beqere 2/146an tê famkirin ku ehlê kitabê -ji ber ku di kitêbên wan da derbas dibe- dizanîn ku dê Kabe bibe qible, lê dîsa jî wan ev rastî vedişart. Ayeta Beqere 2/150î jî vî alîyî ve giring e. Heke qible nehata guhertin, kesên ku li

ber destê wan ew agahî hebû ku dê qible bê guhertin, dê ev yek li dij bewermendan bikirina hincet. Vê îfadeya di dawîya ayeta 150î da nîşan dide ku ev mesele bi mijara nesxê ra eleqedar e: “*Ev, ji bo wê ye ku ez nîmeta xwe ya ji bo we temam bikim û hûn jî li ser rêya rast bin.*” Mirov dikare bibêje ku cihna “hu”yê, ne Pêxember aleyhiselam; guhertina qibleyê destnîşan dike. Lêbelê ev guhertin di heman demê da rastîya ku Muhemmed aleyhiselam pêxemberê Xwedê ye, di nav xwe da dihevwîne. Herî dawî ev ayet dikare weha jî bê wergerandin: “*Ewên ku me kitêb daye wan çawa ku zarokên xwe nas dikin wisa vê dizanin (ku Kabe dê dîsa bibe qible). Lê ji wan hinek bi zanebûn vê rastîyê vedîşêrin.*”

Mînaka Sisêyan: Maîde 5/58

(وَإِذَا نَادَيْتُمْ إِلَى الصَّلَاةِ اتَّخَذُوا هُزُؤًا وَلَعِبًا ذَلِكَ بِأَنَّهُمْ قَوْمٌ لَا يَعْقِلُونَ)

Di vê ayetê da tê ragihandin ku gava yekî misilman ji bo nimêjê bang dida, kesên ku di ayetên berî vê da behsa wan tê kirin -ji muşrik, cihû û xiristîyanan- tinazê xwe bi ezanê dikirin (Teberî, 2001, 8, r. 536).

Di çavkanîyan da hatîye dîyarkirin ku cihna “ha”yê ya zayendmê, hem dikare “es-selat”ê hem jî “munadat”ê ya bi mana “bangê” destnîşan bike (Zemexşerî, 1998, 2, r. 260). Lêbelê çawa ku me berê jî gotibû, gava îmkân hebe ku cihnav ji du tiştan yekî destnîşan bike, ya bingehîn ew e ku bi bal yê nêz ve vegere. Li gor vê, gotina ku cihnav bi bal nimêjê ve îşaret dike, çêtir dixuye. Jixwe tercîha Ebû Heyyan (w. 745/1344) jî ew e ku cihnav nimêjê destnîşan dike (Ebû Heyyan, 1993, 3, r. 527).

Ayet mîna li jêr hatîye wergerandin:

Maneya Qur’ana Pîroz: “*Dema hûn ji bo nimêjê bang didin ew tinaz û yarîyê xwe pê dikin. Ev a ku dikin, ji ber ku ew bi xwe civateke bîrnebir û bêhiş in.*”

Sîwana Qur’anê: “*Gava hûn ji bo nimêjê gazî dikin, ji ber ew qewmekî bîrnebir û kêmaqil in, qerf û henekê xwe pê dikin.*”

Çawa ku tê dîtin di her du mealan da jî cihnav bi şiklê “pê” hatîye wergerandin. Ev jî wê derfetê dide ku mirov wergêranê bi du awayan fam bike: Tinazên xwe bi nimêjê dikin an jî henekên xwe bi banga ji bo nimêjê dikin. Loma wergêrana vê ayetê bi vî şiklî bi bawerîya me çêtir e: “*Gava hûn ji bo nimêjê bang didin, ew nimêjê biçûk dibînin û tinazê xwe pê dikin. Ev ji ber wê yekê ye ku ew, ne civateke bîrnebir in.*”

Mînaka Çaran: En’am 6/20

(الَّذِينَ اتَّيْنَاهُمُ الْكِتَابَ يَعْرِفُونَهُ كَمَا يَعْرِفُونَ آبَاءَهُمُ الَّذِينَ خَسِرُوا أَنفُسَهُمْ فَهُمْ لَا يُؤْمِنُونَ)

Ji ber ku hem di vê ayetê da hem jî di ayeta berî vê da çend tişt derbas dibin, li ser meseleya bê ka cihna “hu”yê bi bal çî ve vedigere, gengeşî heye. Mirov dikare wan îhtimalan weha rêz bike.

1. Cihnav, bi bal Pêxember aleyhiselam ve îşaret dike.

2. Ji ber ku nêzî cihnavê ye, bi bal wê mijarê ve vedigere ku cihû û xiristîyan şahidê wê rastîyê ne ku tu şirîkên Xwedê tune ne.

3. Cihnav, Qur'anê destnîşan dike.
4. Bi bal van her sê tiştên jorê ve îşaret dike.
5. Cihnav, bi bal kitêba ku di destê cihû û xiristîyan da ye vedigere.
6. Bi bal dîn û resûl ve îşaret dike. Li gor vê, dizanin ku îslam dînê Xwedê ye û Muhemmed jî qasidê wî ye (Ebû Heyyan, 1993, 4, r. 96-97).
7. Cihnav, bi bal kitêba ku bi maneya Qur'anê ye vedigere (Maturîdî, 2005, 5, r. 30). Ev ayet di her du wergeranan da mîna li jêr hatîye tercumekirin:
Maneya Qur'ana Pîroz: *"Ewên ku me kitêb daye wan, wekî ku ew kurên xwe nas dikin, eynî wisa jî wê nas dikin. Ewên ku li nefsa xwe xisaret kirin, vêca ew bawerîyê nayînin."*

Sîwana Qur'anê: *"Ewên me kitêb daye wan, çawa ew zaroyên xwe nas dikin, wisa jî wî nas dikin. Ewên xwe xisirandine, qet îmanê nayînin."*

Ji ber ku wekî "wê" hatîye gotin, dîyar e ku cihnav di meala ewil da bi awayekî wisa hatîye wergerandin ku Qur'anê destnîşan bike. Jixwe çawa ku li jor derbas bû, hin aliman ayet weha mane kirine (Ebû Heyyan, 1993, 4, r. 96; Îbn 'Aşûr, 1984, 7, r. 171). Heman cihnav di meala diduyan da bi şiklê ku Pêxember aleyhiselam destnîşan bike bi awayê "wî" hatîye wergerandin. Tê ragihandin ku ji alimên tefsîrê yê serdema ewil ên mîna Qetade (w. 117/735), Suddî (w. 127/745) û Îbn Cureyc (w. 150/767) ayet weha mane kirine (Teberî, 2001, 9, r. 187; Ebû Heyyan, 1993, 4, r. 96). Lêbelê li gor Îbn 'Aşûr (w. 1973) ji ber ku navê Pêxember aleyhiselam li vir qet derbas nebûye, maneya ewil guncavtir e (Îbn 'Aşûr, 1984, 7, r. 171).

Gava mirov vê ayetê bi ayeta berî wê ra bixwîne, dîyar dibe ku mebest jê hem Qur'an e hem jî qasidiya Muhemmed aleyhiselam e. Jixwe ev her du mane jî bi hev ve girêdayî ne. Li gor vê, zanayên cihû û xiristîyan dizanin ku Qur'an jî aliyê Xwedê hatîye daxistin. Herweha ji ber ku di kitêbên wan da derbas dibe, dizanin ku kesê ev kitêb jê ra hatîye hinartin, qasidê Xwedê ye (Îbn 'Aşûr, 1984, 7, r. 171). Lewra di ayetên Beqere 2/89, 146, E'raf 7/157; Sef 61/6an da tê ragihandin ku cihû û xiristîyan hem bi kitêba ku ji Pêxember aleyhiselam ra hatîye şandin, dizanin, hem jî ji ber agahîyên di kitêbên wan da derbas dibin, dizanin ku ew qasidê Xwedê ye. Ji ber vê yekê divê mirov ayetê mîna vê meala li jêr tercume bike: *"Kesên ku me kitêb daye wan, zarokên xwe çawa nas dikin wê jî wisa nas dikin. Yên ku xwe xisirandine, ew kes in ku bawerî pê neanîne."* Paşê di têbinîyê da bi bal maneya din ve îşaret bike.

Mînaka Pêncan: Hicr 15/16-17

(وَلَقَدْ جَعَلْنَا فِي السَّمَاءِ بُرُوجًا وَزَيَّنَّاهَا لِلنَّاظِرِينَ وَحَفِظْنَاهَا مِنْ كُلِّ شَيْطَانٍ رَجِيمٍ)

Di vê ayetê da behsa wê yekê tê kirin ku Xwedê li asîman burc çê kirine. Peyva "burc"ê di erebî da tê maneya koşk û kelehê (Îbn 'Aşûr, 1984, 14, r. 28). Komên stêrkan ên ku asîman dixemilînin ji dûr ve mîna koşk û kelehê xuya dikin. Ji ayeta Mulk 67/5an tê famkirin ku ew li qata ewil a asîmanan e (Qurtubî, 2006, 12, r. 186-187). Ji ber vê yekê ji mufesîrên serdema ewil Mucahid (w. 103/721), Qetade

(Teberî, 2001, 14, r. 31) û Hesênê Besrî (w. 110/728), ev bêje mîna “stêrkan” mane kirine (Qurtubî, 2006, 12, r. 186).

Her du ayet di xebatên navborî da weha hatine wergerandin:

Maneya Qur’ana Pîroz: “*Sond be, me di asîman de hin rêgeh afirandine û me asîman ji bo temaşekeran xemilandîye. Me asman ji her şeytanê qewirandî parastîye.*”

Sîwana Qur’anê: “*Sond be, me di asîmanan de birc çêkirine û ji bo temeşevanan ew xemilandine. Me, ew ji hemû şeytanên recimandî parastîye.*”

Çawa ku hemû mufesiran jî destnîşan kirîye hem cihna di lêkera “zeyyena-ha”yê da hem jî ya di lêkera “hefiznaha”yê da bi bal bêjeya “es-sema”yê ve vedigerin (Teberî, 2001, 14, r. 30-31; Maturîdî, 2005, 8, r. 17-18; Qurtubî, 2006, 12, r. 186-187). Meala ewil li gor vê yekê hatîye kirin û ji vî alîyî ve tu pirsgirêk di wergêrana wan da tune ye. Li alîyê din vê îfadeya “ew xemilandine” di meala diduyan da mirov dikare bi du awayan fam bike. Ya ewil, me asîman xemilandine, ya diduyan jî me burc xemilandine. Lêbelê çawa ku berî niha jî me got, qata ewil a asîmanan hatîye xemilandin; ne ku burc hatine xemilandin. Heman pirsgirêk di wergêrana ayeta 17an da jî heye. Ji ber vê yekê mîna mînaka meala ewil divê mirov di wergêranê da di şûna cihnavan da navdêran bi kar bîne.

Mînaka Şeşan: Hec 22/78

(وَجَاهِدُوا فِي اللَّهِ حَقَّ جِهَادِهِ هُوَ اجْتَبَاكُمْ وَمَا جَعَلَ عَلَيْكُمْ فِي الدِّينِ مِنْ حَرَجٍ مِّلَّةَ أَبِيكُمْ إِبْرَاهِيمَ هُوَ سَمَّاكُمُ الْمُسْلِمِينَ مِنْ قَبْلُ وَفِي هَذَا ...)

Di vê ayetê da berî cihna “huwe”yê û lêkera “semma”yê du navdêr derbas dibin. Yek jê “Ellah” e, yê din jî “Îbrahîm” e. Li gor qayîdeya giştî cihnav navdêrê herî nêz nîşan dide. Loma di serî da mirov wisa hizir dike ku bi wan îfadeyan Hz. Îbrahîm hatîye qesdkirin. Anku her du cihnav jî wî destnîşan dikin (Zerkeşî, 1984, 4, r. 33). Mufesirê bi navê Îbn Zeyd (w. 136/754) û Hesênê Besrî gotine ku xwedîyê ve gotinê Îbrahîm aleyhiselam e. Li gor Îbn Zeyd, ayeta Beqere 2/128an, li gor hinekên din jî ayeta Beqere 2/232yan piştrastîya vê yekê dikin (Teberî, 2001, 16, r. 646; Maturîdî, 2005, 9, r. 418; Bexewî, 1989, 5, r. 404; Qurtubî, 2006, 14, r. 453). Mufesir û alimê zîman Zeccac (w. 311/923) gotîye ku cihnav ji alîyê zîman ve hem dikare Xwedê hem jî Îbrahîm aleyhiselam destnîşan bike (Zeccac, 1988, 3, r. 440). Lêbelê ev her du hizir jî şaş in. Lewra çawa ku Mucahid û Îbn Cureyc jî dîyar kirine mebest ji îfadeya “haza”yê “Qur’an” e. Jixwe her kes dizane ku di wexta Îbrahîm da Qur’an daneketibû. Ji ber vê yekê cihnav, bi bal bêjeye “Ellah” ve vedigere ku di serê ayetê da cih digire. Li gor vê, çawa ku Îbn ‘Ebbas (w. 68/687-88), Mucahid û Qetade jî gotine, Xwedê Teala hem di kitêbên ku berî Qur’anê hatine hinartin hem jî di Qur’anê da bawermend wekî “misilman” bi nav kirine (Teberî, 2001, 16, r. 645-647).

Ayet di her du xebatan da mîna li jêr hatîye wergerandin:

Maneya Qur’ana Pîroz: “*Di ber (dînê) Xwedê de bi rast û duristî cîhadê bikin.*”

Xwedê (ji bo arîkarîya dînê xwe) hûn bijartine. Di mijara dîn de Wî tu zehmetî li we bar nekirîye. Bidin pey dînê bavê xwe Îbrahîm. Xwedê, ji berê de û di Quranê de jî hûn bi mislimanî nav kirine. ..."

Sîwana Qur'anê: "Wekî divê jî ji bo Ellah cîhadê bikin. Wî hûn hîlbijartine, di dîn de jî tu tengî ji we re çênekirîye. Dînê bavê we Îbrahîm e. Ji bo ku pêxember ji we re bibe şahid û mînak hûn jî ji mirovan re bibin şahid û mînak hem ji berê de hem jî di vê kitêbê de wî bi xwe, navê we "musliman" danîye. ..."

Di meala ewil da "huwe" wekî "Ellah", lêkera "semma"yê jî mîna "... nav kirine" hatîye wergerandin. Ji alîyê maneyê ve tu pîrsgîrêk di vê wergêranê da tune ye. Lêbelê mirov nikare heman tiştî ji bo meala diduyan bibêje. Rast e gava mirov li risteya meala diduyan hûr bibe, dikare bibêje ku bi îfadeyên "wî bi xwe" û "danîye" Xwedê Teala hatîye qesdkirin. Lêbelê ji ber ku ji hev dûr in û di navbera wan da navê Îbrahîm û pêxember derbas dibin, mimkin e ku ev mîna gotina wan bê famkîrin.

Ev ayet dikare weha jî bê wergerandin: "Di rêya Xwedê da wekî pêwîst e cîhadê bikin! Wî, hûn hîlbijartin. Di vî dînî da ji we ra zehmetî çê nekir. Li pey şêwaza jîyana dînî ya pêşîyê xwe Îbrahîm biçin! Xwedê, hem berê hem jî di vê kitêbê da navê "musliman" li we kir, da ku ev resûl ji we ra bibe mînak, hûn jî ji mirovan ra bibin mînak."

Mînaka Heftan: Mu'mînûn 23/67

(مُسْتَكْبِرِينَ بِهِ سَامِرًا تَهْجُرُونَ)

Li ser meseleya bê ka cihnav "he"yê bi bal çî ve vedigere, gengeşî heye. Gelek alimên tefsîrê gotine ku bi vê cihnavê bajarê Mekkeyê yan jî Kabe hatîye destnîşankirin. Li gor vê, ji ber ku bajarekî pîroz e muşrikên Mekkeyê xwe pê qure dikirin û xwe di ser însanên din ra digirtin (Ferra, 1983, 2, r. 239; Teberî, 2001, 17, r. 80-81; Zeccac, 1988, 4, r. 18; Bexewî, 1989, 5, r. 423). Li gor vê, herfa "be"yê zerfîyetê anku cih îfade dike (Îbn 'Aşûr, 1984, 18, r. 86). Hinekan jî gotine ku cihnav, ayetên Qur'anê nîşan dide (Maturîdî, 2005, 10, r. 45; Îbn 'Aşûr, 1984, 18, r. 85). Ji alîyê zimanê erebî ve herçiqas peyva "ayetan" a ku di ayeta berî vê da derbas dibe zayendmê jî ji ber ku bi maneya ayetên kitêbê ye, cihnav zayendnêr dikare wê nîşan bide (Zemexşerî, 1998, 4, r. 239; Qurtubî, 2006, 15, r. 64). Di vê rewşê da lêkera "mustekbirîne"yê bi vê maneyê ye: Bi qureti rû badidan. Herfa "be"yê bi maneya "'en"ê ye ku tê maneya dûrbûn û dûrketinê. An jî lêker bi maneya "saxirîne" ye ku tê maneya tinazên xwe dikin (Îbn 'Aşûr, 1984, 18, r. 85). Hin mufesiran jî gotine ku lêker bi maneya "mukez-zibîne" ye û loma jî bi herfa "be"yê wekî gerguhêz hatîye bikaranîn. Anku muşrikan bi derewandina Qur'anê xwe qure dikir (Zemexşerî, 1998, 4, r. 239; Qurtubî, 2006, 15, r. 64). Hinekên din jî gotine ku cihnav Muhemmed aleyhiselam destnîşan dike. Li gor vê tercîhê jî lêker bi maneya "mukezzibîne"yê ye. Anku ji ber ku xwe qure dikirin rabûn ew derewandin (Îbn 'Aşûr, 1984, 18, r. 86).

Ayet di her du mealên me da weha hatîye wergerandin:

Maneya Qur'ana Pîroz: “Bi *Beytullahê* xwe (li ser xelkê) qure dikirin, li dor *Beytê* dikirin *şevbihêrk* ku tê da diavêtin (Qur'an û Pêxember).”

Maneya Qur'ana Pîroz Çapa Dîyanetê: “We, bi *Beytullahê* xwe qure dikir ku di *şevbihêrkê* xwe de we dev diavêtyê.”

Sîwana Qur'anê: “We, di *şevbihêrkên* xwe de jî bi quretî di heqê *wê* de çi dihat ber devê we, digot.”

Çawa ku dîyar e di meala ewil da nêrîna piranîya mufesiran esas hatîye girtin û cihnav bi awayê “Beytullah”ê hatîye wergerandin. Di çapa Dîyanetê da jî heman tişt esas hatîye girtin. Herçiqas zehmet be jî gava îfadeya “dev diavêtyê” bi ayeta berî wê ra bê xwendin, mirov serwest dibe ku muşrik bi şev li hev kom dibûn û di *şevbihêrkên* xwe da dev diavêtin ayetên Xwedê.

Li alîyê din di meala diduyan da cihnav bi awayê ku ayet/Qur'anê destnîşan bike, hatîye wergerandin. Bi bawerîya me jî manekirina ayetê bi vî rengî çêtir e. Lewra di ayeta berî vê da behsa helwesta muşrikan a li dij ayetên Xwedê tê kirin. Ji bo ku hevsengîyek di navbera ayetan da çê bibe, divê ku cihnav bi bal wê yekê ve îşaret bike. Ji xeynî vê, di ayetên berî vê da qet behsa Mekke, Kabe û Heremê ne-hatîye kirin. Loma çêtir e mirov bibêje ku bi cihnavê Qur'an yan jî ayetên Qur'anê hatîye qesdkirin. Herî dawî mirov dikare ayetê weha jî wergerîne: “*Li hember Qur'anê we xwe qure dikir, hûn bi şevan kom dibûn û we gotinên beredayî dikirin.*”

Mînaka Heştan: Yasîn 36/81

(أَوَلَيْسَ الَّذِي خَلَقَ السَّمَوَاتِ وَالْأَرْضَ بِقَادِرٍ عَلَى أَنْ يَخْلُقَ مِثْلَهُمْ بَلَىٰ وَهُوَ الْخَلَّاقُ الْعَلِيمُ)

Di ayeta Yasîn 36/78an da derbas dibe ku kafiran vejîn înkâr dikir û digotin ku ma kî dê wan hestîyên rizîyayî sax bike. Ayetên piştî vê, balê dikişînin ser çêbûna însan a ji hêka bergirtî, di vê ayetê da ew yek tê destnîşankirin ku Xwedayê erd û asîman afirandine, dikare hevtayê wan însanan biafirîne. Bi kurtasî li vir mesele vejîna însanan e, ne dubare afirandina erd û asmanan e (Zerkeşî, 1984, 4, r. 34).

Ev ayet di her du mealan da weha hatîye wergerandin:

Maneya Qur'ana Pîroz: “*Ewê ku erd û asîman afirand, erê ma nikare yên mîna wan biafirîne? Belê, helbet dikare. Her Ew e yê Xellaq yê ‘Elîm.*”

Sîwana Qur'anê: “*Ma yê ku asîman û erd afirandine, nikare yên mîna wan biafirîne? Belê dikare, lewra yê ku diafirîne û zana helbet ew e.*”

Çawa ku tê dîtin di her du mealan da cihnava “hum”ê ya ku pirhejmarîyê îfade dike, bi şiklê “wan” hatîye wergerandin. Bi bawerîya me herçiqas meqseda wan ne ev be jî ji ber ku di risteyê da behsa afirandina erd û asîmanan tê kirin, mimkin e ku ev îfade şaş bê famkirin. Loma mîna vê meala li jêr a baş ew e ku di şûna cihnavê da mirov “hum”ê wekî navdêr wergerîne: “*Ma qey qeweta ewê ku erd û asman afirandine têr nake ku hevtayê wan mirovan biafirîne? Helbet digihîjê! Ew tekûz diafirîne û bi her tiştî dizane.*”

Mînaka Nehan: Fetih 48/9

(لَتُؤْمِنُوا بِاللَّهِ وَرَسُولِهِ وَتُعَزِّرُوهُ وَتُوَقِّرُوهُ وَتُسَبِّحُوهُ بُكْرَةً وَأَصِيلًا)

Di vê ayetê da çar cihnav cih digirin. Dîyar e ku bi cihnava “hu”yê ya di peyva “resûlihî”yê da Xwedê Teala hatîye qesdkirin. Lêbelê li ser her sê cihnavên din bê ka bi bal kê ve vedigerin, gengeşî heye. Hin alimên tefsîrê gotine ku her sê jî Xwedê Teala destnîşan dikin. Hinekên din jî gotine ku cihnavên di van lêkeran da “tu’ezzirûhu” û “tuweqqirûhu”yê mirov dikare bi bal Xwedê ve yan jî bi bal resûl ve vegerîne (Zerkeşî, 1984, 4, r. 36). Li gor Zeccac û Bexewî (w. 516/1122) her du cihnav jî ronîya çavan Pêxember aleyhiselam nîşan didin (Zeccac, 1988, 5, r. 21-22; Bexewî, 1989, 7, r. 299). Li alîyê din ji ber ku bikaranîna lêkera “tusebbihûne” ji bo Pêxember aleyhiselam ne guncav e (Îbn ‘Aşûr, 1984, 26, r. 156), Zemexşerî (w. 538/1144) û Razî dibêjin ku herçiqas ihtimaleke weha hebe jî, lê ji alîyê maneyê ya baş ew e ku hemû cihnav bi bal Xwedê ve vegerin (Zemexşerî, 1998, 5, r. 537; Razî, 1981, 28, r. 86).

Ayet di her du mealên me da mîna li jêr hatîye wergerandin:

Maneya Qur’ana Pîroz: “*Da ku hûn bi Xwedê û pêxemberê Wî bawerî bînin û arîkarîya pêxemberê wî bikin, rêz û hurmeta wî bigirin û da ku sibeh û êvarê Xwedê pak bidêrin.*”

Sîwana Qur’anê: “*Hem jî ji bo ku hûn îmanê bi Ellah û pêxemberê wî bînin, alîkarîya wî bikin û qedr û qîmetê wî bizanibin û sibeh û êvaran Ellah pak bidêrin.*”

Di her du mealan da jî cihnavên di lêkerên “tu’ezzirûhu” û “tuweqqirûhu”yê da bi awayê ku Pêxember aleyhiselam destnîşan bikin, lê ya “tusebbihûhu”yê wekî ku Xwedê nîşan bide, hatîye wergerandin. Bi bawerîya me wergêraneke weha çêtir e: “*Me ev ji bo wê yekê kir ku hûn bi Xwedê û qasidê wî, bawerîyê bînin, qîmeta Xwedê bizanin û wî mezin bidêrin, danê taştê, nîvro û esrê jê ra îbadet bikin.*”

Mînaka Dehan: Nûh 71/21

(قَالَ نُوحٌ رَبِّ إِنَّهُمْ عَصَوْنِي وَاتَّبَعُوا مَن لَّمْ يَزِدْهُ مَالَهُ وَوَلَدَهُ إِلَّا خَسَارًا)

Berî ku em wergêrana ayetê bidin, divê em di heqê daçeka “men”ê da hin agahîyan bidin. Ev, hem wekî daçeka şert ku du risteyan bi hev ve girê dide hem jî bi maneya kes an jî kesan tê bikaranîn. Herçiqas bi maneya pirhejmarîyê be jî ji ber ku daçek di forma yekhejmarîyê da ye di Qur’anê da lêkerên ku piştî wê tên; bi piranî yekhejmar, hin caran jî ji ber maneyê wekî pirhejmar tên bikaranîn (Zerkeşî, 1984, 3, r. 382-383). Heta mîna ayeta li jor dibe ku ewil yekhejmar, lê paşê pirhejmar bê bikaranîn (Zemexşerî, 1998, 6, r. 217-218; Îbn ‘Etîyye, 2001, 8, r. 334-335). Vê taybetmendîya daçeka “men”ê di cihnavên ku wê destnîşan dikin jî xuya dibe.

Ayet di her du mealên navborî da weha hatîye wergerandin:

Maneya Qur’ana Pîroz: “*Nûh got: Xwedayê min! Bi rastî wan guhdarîya min nekir û dan pey maldarên xwe, ewên ku mal û zarokên wan ji bili zeraarê tu feyde li wan nekirîye.*”

Sîwana Qur'anê: *"Nûh got: 'Perwerdekarê min! Ew li dijberî min asî bûn û dan pey ewê ku ne malê wî ne jî zaroyên wî ji xesarê pêve bi kêrî wî nehatine."*

Li gor meala ewil, qewmê Nûh aleyhiselam daye pey maldarên xwe yên ku mal û zarokên wan di şûna feydeyê da zîrar dane wan. Çawa ku ji wergêranê dîyar dibe, cihnav "hu"yê ya ku bi bal "men"ê ve vedigere, ne alîyê wê yê lefzî, lê maneya wê esas hatîye girtin û loma mîna "ewên" û "wan" hatîye manekirin. Lêbelê di meala diduyan da ev yek nehatîye kirin û di şûna ku her sê cihnav bi pirhejmarî bihatina wergerandin, ji ber ku cihnav di qalibê yekhejmarîyê da ne, bi şiklê "ew" û "wî" hatine manekirin. Ev jî dike mirov hizir bike ku temamê qewmê Nûh aleyhislem daye pey zilamekî bi tenê. Lêbelê ayetên piştî vê jî di formên pirhejmarîyê da hatine bikaranîn. Ev jî lazîm didêre ku cihnav bi pirhejmarî bê manekirin (Îbn 'Aşûr, 1984, 29, r. 207).

Encam

Cihnav di Qur'ana pîroz da pir tîr bikaranîn. Ji bo kesên dixwazîn ku bi maneya Qur'anê serwest bibin, tesbîta bê ka cihnav çî yan kê destnîşan dike gelekî giring e. Gava ev yek bi awayekî rast û durîst neyê kirin, dibe ku ayetên Qur'an şaş an jî kêrman bîr famkîrîn.

Tesbît û destnîşankirîna bê ka cihnav bi bal çî ve îşaret dikin yek jî amancên îlmê tefsîrê ye. Lêbelê meseleya bê ka cihnav bi bal çî yan kê ve vedigere, di îlmê tefsîrê da wekî sedemek jî sedemên îxtîlafê tê nîşandan. Lewra hin caran îmkân çê dibe ku cihnav jî çend navdêran bi bal yekî ve vegere. Tercîha yekî jî van ihtîmalan dike ku mane biguhere.

Hin cihnav jî alîyê rêzîmanê ve îmkân heye ku jî du navdêran bi bal yekî ve îşaret bikin. Lêbelê jî ber gelek sedeman divê ku yek jê bê tercîhkîrîn. Herçîqas heman nêrîn hatibe tercîhkîrîn jî cihnav ku di ayeta Beqere 2/144an da cih digire, di wê xebatê da ku jî alîyê Mele Huseyn Êsî û hevalên wî ve hatîye amadekîrîn, ne xerab e. Lêbelê meala ku jî alîyê Abdullah Baykal ve hatîye dayîn, ne zelal e. Lewra wergêrana wî dikare bi du awayan bê famkîrîn. Mirov dikare heman tiştî jî wergêrana ayeta Hec 22/78an jî bibêje.

Di ayeta Beqere 2/146an da em dibînin ku her seydayekî nêrînek tercîh kirîye. Ji ber ku mijara ayetê guhertîna qibleyê ye, nêrîna ku M. Huseyn Êsî tercîh kirîye û li gor wê ayet mane kirîye çetîr e. Ji bo wergêrana ayeta En'am 6/20an jî dikare heman tişt bê gotin. Lewra li wir jî mijar ne pêxembertîya Muhemmed aleyhiselam e; rastîya ku Qur'an kitêba Xwedê ye. Ji bo cihnav ku di ayeta Mu'mînûn 23/67an da cih digire gelek tişt hatine gotin. Lê bi bawerîya me, nêrîna ku di "Sîwana Qur'anê" da esas hatîye girtin û li gor wê mane hatîye dayîn, jî ya dîn baştir e. Lewra li wir behsa helwesta kafîran a li hember Qur'anê tê kirin. Loma tu eleqeya wê bi xwequ-rekîrîna bi Mekkeyê yan Beytullahê ra tune ye.

Li alîyê din cihnavên ku di ayeta Fetih 48/9an da derbas dibin, divê ku ji hev neyên veqetandin û hemû bi bal tiştêkî ve îşaret bikin. Lêbelê di her du mealan da jî cihnav ji hev hatine veqetandin û li gor wê meal hatîye dayîn.

Hin caran jî kes an jî tiştê ku cihnav bi bal ve vedigere di her du mealan da rast hatîye tesbîtkirin, lê mîna ayeta Maîde 5/58an û ayeta Yasîn 36/81ê wekî metnê Qur'anê di wergêrana wan da cihnav hatine tercîhkirin. Ev jî dike ku mane ayetê bi hêsanî neyê famkirin. Bi bawerîya me di rewşên weha da heke navdêr bê tercîhkirin dê mane zelaltir be. Car caran jî mîna wergêrana ayetên Hicr 15/16-17an di hin nimûneyên ji meala "Sîwana Qur'anê" da ji ber ku rêzimana kurmancî baş nehatîye şopandin, rewşeke wisa derketîye holê ku meal şaş bê famkirin.

Herî dawî ji ber ku daçeka "men"ê di ayeta Nûh 71/21ê da wekî şikil di qalibê yekhejmarîyê da ye cihnavên ku bi bal wê ve vedigerin jî yekhejmar hatine. Lêbelê ev daçek hem ji bo yekhejmarîyê hem jî ji bo pirhejmarîyê tê bikaranîn. Em dibînin ku di meala bi navê "Sîwana Qur'anê" da wergêr bala xwe nedeya vê taybetîya wê û loma her sê cihnav bi yekhejmarî wergerandine. Ji ber ku dibe sedema tighîştineke şaş, divê ku alîyê vê daçekê yê maneyê li ber çavan bê girtin û cihnav bi pirhejmarî bîn wergerandin.

Çavkanî

Aydın, İ. (2012). *Kur'ân Müphemleri Olarak Zamirler*. İzmir: Tibyan Yayıncılık.

Ref: (Aydın, 2012, r. 14, 33-35)

Bexewî, H. b. M. (1989). *Tefsîru'l-Bexewî (Me'alimu't-Tenzil)*. Rîyad: Daru Taybe.

Ref: (Bexewî, 1989, 1, r. 162-163, 5, r. 404, 429, 7, 299)

Ebû Heyyan, M. b. Y. (1993). *el-Behru'l-Muhît*. Beyrût: Daru'l-Kutubi'l-Îlmîyye.

Ref: (Ebû Heyyan, 1993, 3, r. 527, 4, r. 96-97)

Ebû Heyyan, M. b. Y. (1998). *et-Tezyîl we't-Tekmîl fî Şerhi Kitabi't-Teshîl*. Dimeşq: Daru'l-Qelem.

Ref: (Ebû Heyyan, 1998, 2, r. 252)

Ezherî, X. b. 'A. (2000). *Şerhu't-Tesrîh 'ala et-Tewdîh*. Beyrût: Daru'l-Kutubi'l-Îlmîyye.

Ref: (Ezherî, 2000, 1, r. 97-100)

Ferra, Y. b. Z. (1983). *Me'ani'l-Qur'an*. Beyrût: 'Alema'l-Kutub.

Ref: (Ferra, 1983, 1, r. 85, 2, r. 239)

Îbn 'Aşûr, M. T. (1984). *Tefsîru't-Tehrîr we't-Tenwîr*. Tûnus: Daru't-Tûnusîyye.

Ref: (Îbn 'Aşûr, 1984, 2, r. 34, 7, r. 171, 14, r. 28, 18, r. 85-86, 26, r. 156, 29, r. 207)

Îbn 'Etîyye, 'E. b. X. (2001). *el-Muherreru'l-Wecîz fî Tefsîri'l-Kitabi'l-'Ezîz*. Beyrût: Daru'l-Kutubi'l-Îlmîyye.

Ref: (Îbn 'Etîyye, 2001, 8, r. 334-335)

Îbn Ebî Hatim, 'E. b. M. (1997). *Tefsîru'l-Qur'ani'l-'Ezîm Musneden Aan Resûli'l-Allah we's-Sehabeti we't-Tabi'în*. Mekke: Mektebetu Nizar Mustafa el-Baz.

Ref: (Îbn Ebî Hatim, 1997, 1, r. 255-256)

Îbn Hîşam, 'E. b. Y. (1963). *Şerhu Qetri'n-Neda*. Misir: Metbe'etu's-Se'ade.

- Ref: (İbn Hişam, 1963, r. 94-95)
- Maturîdî, M. b. M. (2005). *Te'wîlatu'l-Qur'an*. İstanbul: Mizan Yayınevi.
- Ref: (Maturîdî, 2005, 1, r. 265, 5, r. 30, 8, r. 17-18, 9, r. 418, 10, r. 45)
- Muqatil, b. S. (2002). *Tefsîru Muqatil b. Suleyman*. Beyrût: Mu'essesetu't-Tarîxi'l-'Erebî, 2002.
- Ref: (Muqatil, 2002, 1, r. 147-148)
- (2016). *Qur'ana Pîroz û Wergêrana Wateya wê Ser Zimanê Kurdî*. wergêr: M. Huseyn Êsî, M. Se'îd Girdarî, M. Muhemmed Bêrkevanî, İstanbul: Aryan Basım.
- Qurtubî, M. b. E. (2006). *el-Cami' li Ehkami'l-Qur'an*. Beyrût: Mu'essesetu'r-Risale.
- Ref: (Qurtubî, 2006, 12, r. 186-187, 14, r. 453, 15, r. 64)
- Razî, F. M. b. 'U. (1981). *Mefatîhu'l-Xeyb (Tefsîrû'l-Kebîr)*. Beyrût: Daru'l-Fikir.
- Ref: (Razî, 1981, 4, r. 136, 141-142, 28, r. 86)
- Redî el-Esterabadî. (1996). *Şerhu'r-Redî li Kafiyeti İbni'l-Hacib*. Rîyad: Cami'etu'l-İmam Muhemmed b. Su'ûd el-İslamîyye.
- Ref: (Redî el-Esterabadî, 1996, 2, r. 111-112)
- Sîbeveyhi, 'A. b. 'U. (1988). *el-Kitab kitabu Sîbeveyhi*. Qahire: Mektebetu'l-Xancî.
- Ref: (Sîbeveyhi, 1988, 2, r. 6)
- (2017). *Sîwana Qur'anê Meala Qur'ana Pîroz*. wergêr: Abdullah Baykal. İstanbul: Nûbihar.
- Suheyli, 'E. b. 'E. (1992). *Neta'icu'l-Fiker fi'n-Nehw*. Beyrût: Daru'l-Kutubi'l-İlmîyye.
- Ref: (Suheyli, 1992, r. 170)
- Suyûtî, 'E. (2006). *el-İtqan fî 'Ulûmi'l-Qur'an*. Qahire: Daru'l-Hedîs.
- Ref: (Suyûtî, 2006, 2, r. 580-583)
- Zeccac, İ. (1988). *Me'ani'l-Qur'an we İrabuhu*. Beyrût: 'Alema'l-Kutub.
- Ref: (Zeccac, 1988, 1, r. 225, 4, r. 18, 5, r. 21-22)
- Zemexşerî, M. b. 'U. (1998) *el-Keşşaf'en Heqaiqi Xewamidi't-Tenzîl we 'Uyûnu'l-Eqawîl fî Wu-cûhi't-Te'wîl*. Rîyad: Mektebetu'l-'Ubeykan.
- Ref: (Zemexşerî, 1998, 1, r. 344-345, 2, r. 260, 4, r. 239, 5, r. 537, 6, r. 217-218)
- Zerkeşî, B. M. b. 'E. (1984). *el-Burhan fî 'Ulûmi'l-Qur'an*. Qahire: Mektebetu Daru't-Turas.
- Ref: (Zerkeşî, 1984, 3, 382-383, 4, r. 24-41)